Dumahîk : Daxuyana dawî ....

bi ser de jî , berdewamiya karbidestan di bikaranîna tevdîr û qanûnên awarte û nijadperest de , û li pêşî , piroja serjimartina setemkar 1962 , tevî ku sozên dubarekirî ku - xwedêgiravî – lêvegerek bibe û ji ortê rabe .

Ji bilî piroja kembera erebî ya kirêt li despêka salên heftiyan , bi ser de jî li vê dawiyê , derçûna fermanên nû ku hê bêtir desthilatdarî di hemî waran de , di destê hêzên parastinî de be , û rê li ber pêvajo û çalakiyên aborî , bazirganî , kirînfirotana cîgeh û avahiyan teng bibe û bête girtin , nemaze rol û kartêkirina fermana /49/an 2008 an a ku ziyanê dighîne hemiyan û bi taybetî herêmên kurd . Lewre jî , kongirê da xuyakirin ku , ev ton fermanên he , ne tenê bona kurdane û hew , lê belê bona jiyan û pêşeroja gelê Sûrî serûber , nerindî bi xwe ye . Loma jî , pêwîstî li ciye ku , hewildan û çalakî li gel hemî hêzan bidomin , bona berçavkirina ziyan û nerindiyên wan fermanan , da ku lêveger çê bibe , ta ev ferman ji ortê rabin .

Herweha , kongirê bi pesindarî , li rol û xebata Encûmena giştî dinihêrî , nemaze ast û pêşeroja wê ya demokratîk , digel Encûmenên herêman li seranserî welêt , evên ku di siha Encûmana giştî de kar dikin , bi hêviya ku bi roleke erênî û berpirsiyar , gav li ser riya lidarxistina kongirekî niştimanî kurdî bi beşdariya camêrên nepartî li Sûriyê bêne avêtin , da ku nûnertiyeke kêrhatî , ku bibe lêvegereke niştimanî kurdî , ku di çerçewa yekîtiya Sûriyê û pêvajoya wê ya şaristanî de , mafên netewî bona gelê kurd û (Îdara Zatî) ji herêmên kurd re bidestxîne , û xwe di ser xirecira partîtî û zarzimanê durişmevaniyê re bigre û jê bidûrkeve .

Li hêla dî , hate dîtin û nûkirin ku xebat û hewildanên bona lidarxistina kongirekî niştimanî Sûrî giştî , her li cî ye , û gotûbêj di vî warî de berdewam û li saz be , bona şirovekirina rewşên Sûriyê , bi beşdariya hemiyan , bê ku kes bête bi dûrxistin , nejî , li gor aliyeke yekane be . Şêweya aşkere , berçav û rû li rû , bingeh be , dûrî reşî û tariyê be .

Di warên kurdistanî û netewî de , kongirê didît ku , herdu hikûmetên Anqerê û Tehranê di bin perda (li dij teror û cudaxwazan) tepsandin û perçiqandinê di derheqê Kurdên sivîl de didomînin , û di derbarey pirsa kurd de bêçare dimînin , nikarin bi hawakî şaristanî , xwe nêzî pirsê bikin , her û her di wê paşverûtî û hiştengiya xwe ya dîrokî de mane . Û dihate dîtin ku , têgihaştina siyasî û hişyarbûna demokratîk , li ba hêz û rêxistinên siyasî û rewşenbîrî , çi li kurdistana Turkiyê , ya Îranê û çi li derve , li xerîbiyê , her diçe zengîn dibe û pêş dikeve . Li hêleka dî jî kongirê didît ku , hê gelek pirsgirêk di navbera hikumeta herêmî ya kurdistana Îraqê û hikumeta Navendî de , bêçareserî , li holê û lidarin . Lewre jî , pêdivî her ewe ku , ev serpêhatiya ferderalizmê li kurdistana Îraqê bête parastin , digel û di çarçewa pêşketin û pêvajoya jiyana siyasî li seranserî Îraqê , bona xêr û xweşiya hemiyan , dûrketin ji nexweşî û rûdanên biv .

Herweha kongirê bi erênî li pêşketina guhdana cîhanî li pirsa demokrasiyê , **D.R (11)**